
MEHDİ ZANA



# EVÎNA DILÊ MIN

Poetika Dizisi

# EVÎNA DILÊ MIN

**Mehdi Zana**

Poetika Dizisi

Birinci Baskı
**Ekim 1993**
Dizgi
**Belge Yayınları**
Baskı
**Gül Ofset**
Kapak
**Zehra Şenoğuz**

belge yayınları

BELGE ULUSLARARASI
YAYINCILIK

Başmusahip Sokak
Talas Han 16/302
Cağaloğlu - İstanbul
Tel / Fax: 511 63 20

Poetika Dizisi

*Poetika* dizisinde Kürtçe ilk şiir kitabımızı
yayınladığımız için sevinçliyiz.
Mehdi Zana Kürtçe yazma yanında
Kürtçe konuşmanın da kavgasını en ağır koşullarda,
yıllarca inatla vermiş bir kişi. Mehdi Zana, Vedat Aydın
ve diğerlerinin bu alanda bilinçli olarak verdikleri
mücadele, Kürtçeyi yasaklayan özel yasağın kalkmasında
etkili oldu.
Bu yasağın etkisi sivil itaatsizlik tavrı ile kırıldı.
Dünyada bir anadili yasaklayan, ilk ve tek örneği olan
yasa böyle kalktı.
Ama bu alan hâlâ dikenli tellerle çevrili.
Daha yapacak çok iş var.

## PÊŞGOTIN

Ev helbestên ku min nivîsandine, nayê vê wateyê ku, ez xwe wek helbestvanekî dinirxînim.

Min ev helbest, di navbera salên 1990-1991'an de, piştî derketina Zagona Anti-Terorê nivîsandin. Armanca min di vê yekê de li hemberî vê Zagona Anti Demokratîk şer kirin bû. Ev helbest di nava mehekê de, hestên ku, di dilê min de pêl didan, tînin ziman. Dema ez ji girtîgehê derketim min dil tune bû ku ez wê bidim çapê, lê ji ber ku ev bi Kurdî bûn û pêdiviya min bi rexneyan hebû, ez wan didim çapê û li hêviya rexneyên dostanî me.

Mehdi Zana

## EZ MINZUR' IM LO

Ez Minzur'im lo
Bi dengê lawan
Tim welidîm bi kul
Di xwînê da mam
Sed sal e birîndar
Diherêkim bi yar
Ez Minzur ' im lo
Bi dengê lawan

Ez Minzur'im lo
Bi porên keçan
Li ser min qîrin
Dikêşiyan can
Hîrîna hespan
Cengewer bi şur
Birîn di kur da
Dilop dilop xwîn
Ez Minzur 'im lo
Bi porên keçan

Ez Minzur'im lo
Bi şîren dayikan
Dengê gur û çeqelan
Di laşan da man
Min tu car venekir
Bi bûtikî mam
Ez Minzur'im lo
Bi şîren dayikan

Ez Minzur'im lo
Bi hêstiren çavan
Min deng daye
Bi îsyan û dozan
Tim di şer û ceng da
Bi eman û loman
Heta gihîştin
Egîtek û şerwan
Ez Minzur'im lo
Bi hêstiren çavan

Ez Minzur'im lo
Sitara me şikeft bûn
Bi dengê BESÊ
Piwend şikandin
Şikeftên tarî
Şerme ji me ra
Têkevin Şîn û girîn
Nenihirên kalim
Dinya diheje
Wexta biqîrim
Ez Minzur'im lo
Sitara me şikeft bûn

Ez Minzur'im lo
Biryar im îro
Me sil pêlan da
Kişîyan ser dijmin
Her weki ba bûn
Dayik bi laşi
Zilm nameşe
Tari da ser me
Hîv nameşe
Ez Minzur'im lo
Bi biryarim îro

Ez Minzur'im lo
Bi dengê lawan
Bûtik pêşkevin
Dêrsim agir da
Qehreman pê ketin
Evîn di dilan da
Ez Minzur'im lo
Tim bi birîndarî
Me di şer da
Qet xwe ne da alî
Ez Minzur'im lo
Tim bi birîndarî

## EVÎNA MIN

Evîna min guhdar be li singamin
Binihêre çewa davê dilê min
Bi evîna te dikele kulê min
Çarek tenê xuya li ber çave min
Ewqas sal e bi evîna te dijîm
Di qîrim ez, erd û asîman diheje

Evîna min tu dil zanî çîye
Tu car li derîya notirvanî kirîye
Ne seatek ne rojek
Sal bi ser de hatîye
Dîsa ev dil
Berê xwe ji te nezivartîye

Evînamin eşqa dilê min
Were têkeve milê min
Kilame ji te ra bêje dilê min
Binihêrê bibîne halê min
Ketime çi derdî
Van eş û êlema
Bi evîna te re dît

Evîna min tu çîçeka min î
Ma qey tu ne emîn î
Di nava dilê min de yî
Leyla û Mecnûn
Mem û Zîn
Hemû bi evîna mi re dijîn

Evîna min te bi hêstirên çavan av da
Di nav gulan da
Te rakim bi kevdî
Dînim ser dilan
Her nihêrtinê geş bike evîna dilan

Evîna min tu çîçeka ber dilanî
Qet li halê min napirsî tu çewa yî
Çima ewqas bi loma yî
Qesem dikim bi navê te
Min dil neda xeynî ji te
Heta bimrim herim gorê
Dile minda evîna te

## BERSIV'A PÎROZBAHIYA KOMELA JINEN KURD LI SWEDEN

Destek ji dûr
Bi dostanî
Direj bû hêla me
Germ û nerm
Dilê min mizda
Pîrozbahî'ya salê
Ax gelo min jî bibin balê
Dawî 'ya salê
Têkevim milê wan
Li çolê
Rakine welat
Xwe bidine dorê
Çi tê serê me bira were
Em natirsin ji zorê
Bistînin ala renqîn
Hildin jorê

## ÊY WELAT ÇIQAS TU XWEŞ Î

Êy welat çiqas tu xweşî
Bi bûkanî rûgeşî
Dilxwazê minê
Evîndara te me
Sorgul û çîçek
Li ser te çandî
Soza me heye
Ji bo xelasî
Canê me qurban
Bese bindestî

Li Mihabad qîrîn
Mihamed gazi
Wa ye em hatin
Serqot û tazî
Bagûrek rabû
Ji xew hişyar bûn
Balafir hatin
Agir reşandin
Çîyanê barut
Şerekî giran
Bezîyan li ser te
Siwarê Medan
Kefxweşî da me
Tevgera Kurdan
Kule me pirin
Şahid e Amed
Destê xwe da me
Birayê Gerabet
Di bezin ji bo te
Tev gelên Kurd
Nezik bû xelasî,
Tu negîrî Kurdistan
Tim di şer de ne
Havîn, zivistan
Derengî mane
Tu me bibexşîne
Bêxeml û bêrewş
Çiqas tu xweşi

Waye keçên te li peş in
Ala rengîn di destan
Ev xelatek pin givan
Zana dı be qurbanim
Di bin barek giranim
Pêçandîme seransêr
Bi evînek tev keder
Di welgera xelasî
Tev da dilxwaz dibezî
Dimeşin bi dengî
Şiyar bilind bûn
Sitran di banin
Li Sîpan bişkuvîn
Kulîlkên daran
Ringîna def û zirnê
Bi loranî dengîye
Li her alî dîlan e
Kef xweşî û şayî
Tu dergîsî ya min î
Ez xwezgîniya te me
Soze te he bû
Ka mizgîniya min
Dîyarekî bê lome

Bes êdî lê heviya te me
Te ji  xwe re naxwazim
Tu gelên Kurda
Maçek tenê di xwazim
Êdî ez serfirazim
Tim di fîlketa te da bûm
Bi vî dil birîndarî
Bi salan evîndarim
Bi te bawerî



## MESONT XWARIYE

Diyar bi diyar
Di geriyam li Kurdistan' ê
Ji Elbat çûme Ribat
Hilkişîyam Mereto
Dest bilind kire Sîpan
Qîrîn ji Nemrût rabû
Hewar li xortên Kurdistan

Dijmin girt hemû çiyan
Deşt û gund û bajaran
Rez bi rez leşker dikişîn
Serê kuçan û debaban
Keç û xort di zincîra de
Avêtin girtingeha
Bi kamçî û bi lêdan

Hezar salan beziyan
Li ser van erdan
Gutî Kardu û Sîwaren Medan
Lê îro di bin destê dijmin de
Êrişê li kuçan
Di bezin direvin li meydan


Evrekî reş û tarî
Bi zor destî di ser meda
Li hawirdor mijokdar
Em kirîne çar perça
Balafir mirîn reşandin
Li Dêrsimê Halepçeyê
Dil bi kul û birîndarî
Xwe li welat di pêçî

Bi tîrêja rojê da
Wa hîşyar bûn kurên te
Rojîya mirênê de
Cîvan merd li pey da
Daliqîyan ji boy te
Bi kesera mizgînî
Keç û xortên dilowan
Bi evîna te qurban

Gazîya vî agir bû
Bi terqîna martînî
Başokek firî
Ji bircên heft biran
Alavek rabû girte asîman
Di nav de diqîrî Zekiye Alkan
Divê canê min ji te re qurban
Bijî welatêmin welat Kurdistan

Em şîn nagîrin
Bê naz û bê gazin in
Wa ye hewar da ji bo te
Tekoşîn dixwazin
Singa xwe dan ber êrişa dijmin
Welat hembezkirin
Bi xwîn û mirin

Me sond xwarîye
Pare nakişin
Heta mirinê diçin şoreşê
Dengek lêda em di peyda
Çîya û deşt û zozan
Kurd hemû dibezin
Êdî em serfiraz in
Li dû kesî nabezin



Ax welat birîna me kure
Kes li me nanêre
Em dermanin ji bo xwe
Emê binêrin li xwe
Xizanî nezanî tev li me an
Çima gelên dinê bi me nizanî

Lava dikim gelên min
Bes kevneperestî
Li hawirdor xwe binêre
Nema êdî putperestî
Wexta me tenge
Her deme ke zor
Li hawirdor şer û ceng e
Nanêre wisa kore kor
Notirwanîya welat e
Bistînin ji hev bi dor

Ev dewra rawestînê nîn e
Şoreşê bidomîne
Rêyekî dûr û zehmet
Dilê min jî bi rê ket
Çîyayê Zagros
Ji mera tenê bû dost
Şerekî giran da ber singa wan
Kurên te rabûn wek egîtan bûn
Gûlê te rabûn dijmin li babûn

Bilind bû rizgarî
Way Ala rengîn
Şalûr û bilbil hemû bidengî
Sorgul û, çîçek li ber te danîn
Xelas bû welat
Em îdî Felat
Lawjan û sitran qîrîna kurda
Paykirin biratî ket nava dilan
Bihevre banîyan mîzgîne gelan
Pîrozbayîbe serfirazîya
Kurdistan

## DIKELE KÛLÊ MIN

Roj çû ava
Dengek li şerqî da
Bayekî giran
Sirek cemidî
Tevzî li canê min
Ji bona van kulan
Derman ji ra ev şerê Kurda
Me kurban daye
Bi sed salan
Guh bidin çar aliye Kurdîstan
Êlan e êlan e şerê mêrane
Da ser milê min
Kulên gelan e
Lêdixin kurên te
Tiving li milan e
Çîçek li desta
Fetha dîlane
Bi salan e ev dawet
Em di nav dane
Mijokdar jî tê da
Timî talan e

Lê dan û kuştin
Bi te nehiştin
Mejî xelet kir
Dijmin tev kar kir
Me ji hev belakir
Bê yar û war in
Lê îro em şîyarin
Li ber welat in
Bilind kin tekoşîn
Ji nu de lêkin
Xweşî û Evîn e
Di nav dila kin

## DÎLBEREK KET DILÊ MIN

Dîlberek kete dilê min
Li nava Dîyarbekir'ê
Awir bilind bû
Pir xweş û bedew
Çîçeka min tune bû
Min dilê xwe da ber
Vê qet li min nenêrî
Berê xwe da der
Dilê min go pêkeve
Newêr bûm
Wek devlemendan bû
Ji avêrê em xuya bû
Min nihêrî nabe
Beziyam li dû
Peya bû
Ew çû
Min da dû
Li dergê girî
(Go) çima dinihêrî
Min go ji te hezkir
Çima tu dixeyidî

Go birîndarim
Li tiş tek nanihêrim
Min go derdê te
Go way li berte
Bêje derdê xwe
Bibêjim derman
Go qey tu nêzanî
Min go çima çi bûye
Dinyaye waye Ne derde ne êşe
Bi xweşî dimeşe
Go way belengaz
Nezanê dilxwaz
Ma qey tu hay ji xwe nînî
Tu çewa xwarî bibînî
Ma qey tu ne Kurdî
Tade û zilum qe nedît î
Kulê xwe û gelan
Jimin re derkir
Hemû derdê xwe li milẹ min kir
Min nîyet guhart
Tev bûme guhdar
Go fermane fermane



Da ser Kurdane
Derman tu nîn e
Di nav qulane.
Xelasî pir xweş e
Bêşer nameşe
Karker û gundî
Xwe bidin pêşe
Xwenda û xortan
Têkin milênwan
Jinên Kurd di nav hemûyan
Xwe bidin xebat
Xelas kin welat
Ku bibin felat
Ew çax min bibîne
Binihêre çewa xwezgînî me
Di nav derî de
Li hêviya wî dilî me
Min go ez jî heme
Sozê didim te
Kes ji min ra ne goti bû
Hemî nezan bûn
Lê êdî zanim

Li ber welat im
Tivinga min derîne
Ji nûde min bibîne
Ma qey ez tolaz im
Li dû keçan dibezim
Her dem wekî baz im
Binihêre di şer da
Çawa dibezim
Ev şîyariya te
Qet ji bîr nakim
Sipasî jî te ra
Set carî sipas
Bi keserekî giran axîvîm
Min evîna te kir nava dilan
Heta serxabûn ku bibe êlan
Milê me bi hev re bikine dîlan

## DAXWAZÎ

Delal hêzkirin pir xweşe
Bi pê girtî dimeşe
Yeka tenê
Ez dile xwe bidimê
Dil geş û nihêrtinê wê xweş
Merd û bedew
Ji min re nebe keder

Delal hêzkirin pir xweşe
Ji dil
Ku ne be kul
Bi tevayî bifikirin
Xey da wan tunebê
Ser girêdayî çav nebar
Oyun û naz
Wek tîre vîraqaz

Delal hêzkirin pir xweşe
Bi hesûdî û fesadî
Singa xwe bidin tengasî û zorê
Timatî ne li dore
Her dem bi kêf
Destê wê de kar
Neke zare zar

Delal hevîdarim ji yezdan
Wan ehlaqê nebaş
Li serê tu malî nebe bar

Delal xweşkayi û bejin
Bedenî nihêrtin
Tu car menêrin
Bi kar û hevaltî
Dil û zimanê rast
Şerm û îffet
Mala bi akubet
Xweşî dide însan
Ji jîyane ra bereket

## KEÇÊ TU KEÇA KURDANÎ

Keçê tu keça Kurdanî
Kulîlka nava dilayî
Her dem li ser milan
Wek qevda nêrgizanî

Keçê tu çiqas xweşî
Wek încîya rû geşî
Kevoka ser vî banî
Mizgîna te ji mir' anî

Keçê nave te gûlîstan
Min jî bibe Kurdistan
Çîçeka li ser dane
Bi xwînê avdane

Keçê birîye te reş in
Biskê te jê re rewş e
Bîn didî be miskî
Ev dil ji te hez dikê

Keçê tû buka kurdanî
Deweta dilê xortanî
Meşa te kewa gozel
Dil jî pê ra dileze

Keçê memkê te xweş e
Wek mijmijoka dimije
Singa te weka zozan
Çîçeka nava rezane

Keçê tu kilaman bêje
Bilbil li ber te gêje
Ser bilind anî vekirî
Awir bilind, ken gûlî

Keçê tu birîndarî
Ketî binê vî barî
Êdî mirin ji derdan
Di hesreta te de man

Ax keçê ax keçê
Xwe li evînê bi pêçe
Kesk û sor û zer xemila te
Waye Gelên Kurt li ber te
Tev da bi te hesret e

Keçê leske wext bihurî
Suwar hatin ber derî
Bes êdî xwe dixemlînî
Ala rengî li destê wan
Li hêvîya xemla gulîstan
Ewê te bibine Kurdistan



## NÎŞANA MIN MAÇKIRIN

Hezkirina welat
Bi ser evînê de hat
Herdu bûne yek
Jîyana min ra bûn çîçek

Dilê min dikîşîne
Şeran dimeşîne
Lawja û stran
Bezîyan li çolan
Ka suwar ka peya
Hîrîna hespan
Nali wan di kolan
Çirîska wek birûskan

Tiving şeqirîn
Meydan vekirin
Deng da şerê me
Şa bû dilê me
Kefxweşî da halê me
Kewand kulên me

Singa minê kûr
Wek tenûrê sor
Bînên derdê gelan
Bavên bi milan
Xençer ti rakek
Xwîn ji na herike

Min çav berdaye
Dilê min di welat da ye
Nîşana min maçkirin
Binefş li singa kirin
Dilê min bi der e
Hemû derd û keder e
Kedera li ba bikin
Xweşê rabikin
Bi ser gelan de bikin

Min dil da ye însanî
Wek kulîlka nîşanî
Dilop dilop avî me
Li ser pêlan xuya me
Mijmijok im dihejim
Bi lêvan da dimijim

Çaxa li min nihêrî
Wexta dilê min bihurî
Wan çavê mêşînî
Hiş û aqlêmin dikişînî
Bi bûkanî xemilî
Derdu kederê min vemirî
Dil hîrîya bu qare war
Bilbil sekinî bû godan

## SAZBENDO LÊXE

Go sazbendo lêxe
Wekî dilê min lêxe
Van eş û eleman
Dilopa xwînê
Derba evînê
Anî ve demê
Go sazbendo lêxe
Wek dilê min lêxe

Go sazbendo lêxe
Dila birêxe
Dijmin dîsa hat
Ev êrîşa pîs
Dikuje gelên min
Xençera dilê min
Go sazbendo lêxe
Agirê dilê min pêxe

Go sazbendo lêxe
Bi dengî lêxe
Agir bilind bû
Ewrek li ser min
Dengek di nalî
Her wekî kalî
Go sazbendo lêxe
Bira dilê min bi kelî

Go sazbendo lêxe
Bi awirî lêxe
Te vî qûlênga
Wan rakin ser lingan
Ka evîna min
Hesreta dilê min
Go sazbendo lêxe
Bi kurdî lêxe

## NEWROZ

Bîst û yekê adarê
Çîçek li gulîyê dare
Newroz cejna kurdaye
Rêşana dilê gelane
Bilind bu alavek sor
Ketin nava şerekî zor

Tevir û das u ınelêwan
Hemû li ser milê wan
Li ber zilma mijokdarî
Civiyan bi çekdarî
Alaya destê Kawa
Hilveşand hemû saraya

Deng da dora welat
Xera kirin pût û lat
Gelên bindest şîyar bûn
Hemû devlemend ta bûn
Mizgîn li bihare bû
Zilm û te de tev rabû

Dilo leske bi dû keve
Bi derengî ne keve
Herkes di nav xuyaye
Kes li derva nema ye
Ev deveta kurda ye
Xelasî di evîn da ye

Bûk bi Newroz xemilî
Agire dila vemirî
Govend bi Newroz xweş bû
Şayî bi dila geş bû
Çîçek li ser dila kin
Di ava gula da kin

Dila bixemilînin bi xweşi
Bira kes pê ne êşê
Dinya besî tevaye
Bi hezkirina gelan e
Mizgîn li biharê
Tevda civîyan li bin darê



## BERSIVA MIN JÊ NAMEYA QUREMIN RONAY'RA

Raste kurê min
Parêzîya welat
Bo jîyanê ye
Jîyîn bi gelan xweş e
Ku bi biratî bimeşe

Rakin mijokdariye
Bi şer û mirin
Bi hev re bigerin
Hesûdî tuneye
Bi xweşî binêrin

Zana û şîyarbin
Nemîne reng û dîn–(ol)
Bi mîlîyet û kîn
Insanî bilind kin
Wek çîçeka jîn

Ev çi nîzame
Axa û xûlam
Dewlemend û karker
Me bi xwe xerakir

Herkes kûrê bavê xwe
Ez li berxwe binêrim
Tu li ber xwe
Ev çi şere me kire nava xwe

Me çêkir ferqiyet
Bû mirdar û dert
Qirîn û fîxan
Bi nav xelqê ket
Ax nezanî ax nezanî
Dinya kî xwar ji me ra danî

## DILO ÇIMA BI DILÎ

Dilo çima bi dilî
Li vî milî li wî milî
Xwe nede ber tu derê
Tu xêrek nay ji xerîbiye
Li hawirdor xwe binihêre
Berde hezkirina yek dilî
Qirîne li ser welat
Bi hewar û gazî
Nema êdî mijokdarî
Dinya guhirî
Ew dem bihurî
Xwe bidine xebat
Bê serxwebûn nabe
Wê kade te timî li ber xelqê be
Belengaz û stû xwar

Di bin barde tewandi
Ax dilo
Çima evqas ker dilî
Hilweşe
Bavêje wan derdan
Ev çi bela bû
Li ser me barda
Sed sal e
Di nav wan derdan
Me xweşî nedîtî
Herdem bi eşî
Nêhêrtina te wek derweşî
Wext hatiye
Destê xwe bidine welat

Wî bikine xelat
Berdêlî xebat
Xemla wî evîn
Bêşa vî rewş e
Bi rastî dimeşe
Jiyan bû welat
Pir xweş e
Keç û xort bi hevre
Xwe bidin pêşyê
Dilo bi dilxwazi
Bi jîndinê ra li welatê xwe binihêre
Zilmê teda rakin
Xerabî li bakin
Evîn di nav dinê kin

## ÊY KÛRÊN KURD

Êy kûrên Kurd
Paşmêrê xelqê
Derkeve meydan
Binihêre bibîne
Dinyake nû dene
Ew çi kareware
Kurd hemû bindestê mijokdaran e.
Bi hezaran şehîd dan
Birîndar û xwîn rêtin
Şewitandin bêdera
Mal û dar û bêr
Ji te ra hîştin ew qasal keder
Ew dewra seyara
Bi xebata we ra
Li îro binihêrin şerekî zor e
Bi hesûdî pê bigirin
Xwe bidin dor e
Herine ser dijmin
Firstê nedin

Êy kûren Kurd
Paşmêrê xelqê
Derkeve meydan
Tim agir bû
Binihêre li tarîxan
Hê do bû
Li Amed û çan din
Nod û çar can bûn
Yek bi yek daleqkandin
Hê şefeq ne da bû
Deng da Warto, Zîlan, Pirareş
Xençer di birîna re kir.
Wan xeberên nexweş
Li Dersimê tevkuştin
Qiyamet li wê rabû
Dayê dayê dayê ya zarokan
Bê şîr bûn
Can di nav xwînê de
Ew dê û bavê wan bûn
Ewte ewte kuçkan dihat
Singûyê cendirman sor bûn
Çiya bi deng
Minzur melûl melûl diherikî
Kes li dorê tune bû

Êy kûren Kurd
Paşmêrê xelqê
Derkeve meydan
Jê re xuyabe
Wek Selahaddîn ne ji xelqê re be
Hêvîyame tû yî
Bi te bendewarin
Li tiştek nanêrin
Yek daxwazîyame heye
Ew jî, xelasî
Rakin Kurdistan
Bese bindestî
Set salen belengaz
Tim ji xelqê ra dilxwaz
Geh Ecem û Ereb
Geh ji tinkare dibezin
Bes êdî li dû wan
Ji xwe ra bixwazin

Êy kûrên Kurd
Paşmêrê xelqê
Derkeve meydan
Waye gehîştin gelên me
Xwe dane dora te
Bo azadiye dimeşin
Serqot û tazî
Ciwan mert li pêş in
Li Mihabad û Zaxo
Qamişli Amêd
Jinên Kurd bezîyan
Derî vekirin
Roj di çîyane da xuya bû
Bilind bû pêl bi pêl
Agir di nav dîlan bû
Hişyar, qirîn û şer
Meydan da ber
Tirs nemaye
Wan dilê xwe daye
Bo xelasiya Kurdane (Kurdistan)

Êy kurên Kurd
Paşmêrê xelqê
Derkeve meydan
Jiyîn bûye jar
Bi domîne şer
Ev sed sal in
Tev keder û xapandin
Nema êdî bawerî
Tim reş û tarî
Êrîşa netevî
Dilê gel dinalî
Şoreş dibanî
De lêxin
Kurên Kurd
De lêxin
Li serê mijokdara xin
Wexta ku runî
Tu pir bidî xwîne
Neyne wê demê
Leskin bi şer berdinê
Bi şer berdinê

## HEVALÊN KARKER

Tu hevalên karker
Tu çi bikî dewlemend ne însanin
Perçebûn kir nav gelan
Bi qewmiyet û dîn
Meriv ket xerîbî
Bi welwela jîn
Wek sîsareke gurî
Di mirovanî de rîn
Şex û mela ew jî bi were
Bûn ortexê perçeloqa wan
Ew dewlemend in, tu li xwe binêre
Bes e êdî xebata xwe, di bi jiwîre

Tu hevalen karker
Ew dewlemend bêbexte
Bûn hevalê Isa
Bi îbadeta sexte
Pere û pul û zêr
Ji devê wan tê hemû çêr
Wan însanî ne dîtiye
Bûn bêdara pîsîtiye
Kes xwe nede dora wan
Timî li ser pişta me ye
Hemî keyf û eşqa wan

Tu hewalên karker
Ew sermayedar e
Xaîn û xedar e
Xweydana me ye
Jêre bûye male
Qet li halê me nabe guhdar
Yek derdê wî heye
Bilind be pereyê wî
Em birçî û zarokê me tazî
Xema wî ye dibin bar de dihejî
Li te dinêre wek çavê tajî

Tu hevalên karker
Te çima wiha kir
Te mala xwe bixwe xirabkir
Wiha nameşe
Rabe hilweşe
Rakinen dara dijî maldara
Wan têkin çalan
Wek koremaran
Bipelîxinin serê wan
Xençer nav dîlê wan
Serxweşi nîne
Kêfxweşî tîne
Derman e ji te re, xelasî tîne
Bi dereng nemîne,
Lezbike tewra xwe deyne



Tu hevalên karker
Em jî însan in
Xwedê canin
Bi jîyanê zanin
Tev xebata me ye
Li dinê war e
Wek mêşa dixebitîn
Me hingiv ne dîtin
Her dem bi hesretin
Bê qedr û rûmetî
Wan avahîya me lêkir
Derîyan wan vekir
Em jî kirin notirwan
Bêtişt û bêcî

## POETİKA ŞİİR DİZİSİ

*Hüseyin Erdem*
DAĞLAR TANIKTIR
*Yücel Sivri*
DÜŞDÖKÜMÜ
*Ayten Uyan*
BİR SEVDA YOLCUSUYDUNUZ
*Mecit Ünal*
REQUIEM
*İbrahim Karaca*
ARDINDAN
*Ayşe Hülya*
DÖĞÜŞENLER KONUŞACAK
*Halil Güçlü*
YURDUNA DÖNEN GILGAMIŞ
*Nur Bulum*
YÜRÜ DİRENCİM
*Fadıl Öztürk*
SUYU UYANDIRIN SESİM OLSUN
*Safa Fersal*
SENİ BİR GÜLE ARMAĞAN ETTİM
*Mustafa Doğan*
FİRARİ DÜŞLER
*Hüseyin Şahin*
MAVİ BİR LEKE
*Nuh Ömer Çetinay*
KANREVANMARAŞ
*Soysal Ekinci*
BİRİ YİTİK İKİ ÜLKE
*Soysal Ekinci*
ÇAĞRI
*Kenan Özcan*
SİZİNLE KALDI SEVDAM
*M.Ender Öndeş*
İNCE YAZILAR



MEHDİ ZANA



Te ji xwe re naxwazim
Tu gelên Kurda
Maçek tenê di xwazim
Êdî ez serfirazim
Tim di fîlketa te da bûm
Bi vî dil birîndarî
Bi salan evîndarim
Bi te bawerî

Amblem Deseni: Ritros
Kapak Resmi : Tekin Fırat, Nevroz